Ezmûneya partiya Demuqrata Kurd li Sûriyê (Elpartî) di vî warî de pir zengîn e, her ku ev partî perçe dibû ev yek



Ebdilselam Xoce Amûdê

dihate gotin, aliyekî ji yê din re digot ku tu ne Barzanî yî, ji ber vê yekê em perçe bûn, Subhan Ji Navê Xwedê Re...!!!!?

Ger min wênayê Barzanî hilgavt gelo ez Barzanî me?  
Ger min gotarek, yan wênayek bi serok Mesûd re kişand ez Barzanî me?  
Ger ez bûm aligirê PDK-S ez ê bibim Barzanî?  
Ger di belavok, gotar, û helbestên xwe de li ser Barzanî axivim ez ê bibim Barzanî?  
Mixabin îro mirovên ku koletiyê dikin û derew û berjewendiyên xwe yê kesayetî û partîti di ser her tiştî re dibînin xwe dibînin Barzanî û divê tu aligirê wan bî, yan tu ne Barzanî yî. Ev e tiştê ku dixwazim bibêjim, ez ê berdeyam bikim ku Barzaniyê ji wilo mezintir e, her wiha bilindtir û paqijtir e, û bi gelekî jî.

Lê weke ku min bi pirsan dest bi vê nivîsê kir, ez bi pirsan wê bidawî bikim. Gelo hûn dizanin ku Barzaniyê sinc û tîkoşîn e, Barzaniyê kurdayetî ye, hezkirin û wefadari ye?!



# Nazik Elmela'ike.. Helbestvana Kurd Xunav Kano Ji «Bûyerpress» Re Daxive

- Li Heskê li ser banê malê-di wê demê de-weke trafikekî min çavdêriya stêrkên dikir, û çavên minî nezan nêçîra wan stêrkên dikir.
- Helbest salên jiyana min kêr dike, lê hestên min mayinde dihêle.
- Helbesta minî yekemîn bi zimana Erebi bû, ew li ser terezorê bû lê bi wateyê nûjen bû, behsa qedê û xwesteka mirov di jiyana de dikir, nuha 7 sal derbas bûn û hîn ez berdeyam im.
- Helbest azadiyê dide min û jîwera minî derûnî ji min distîne, wateya hebûnê dide min û ne aramiyê ji min distîne.
- Dema min Mu'alleqatên Erebi xwendin weke ku nameyek ji min re were ku helbest dikare mirinê têk bibe.
- Herweha ji bo ku welat nemîne zindaneke mezin û hewelatî tê de bi azadî bifire divê ew hesinên dora azadiyê bîn şikestin.
- Ez ne gellekî bi ramana hebûna yekîtîyêkê ji nivîskaran re me.
- Ez rêvebira beşê Kurdî di radyoya "WELAT FM" de me, 3 bernameyên min hene.
- Gendelî di hemû warên ragihandinê de heye, herweha herdem piştigiriya diravî dibe listikvanê serek e di rêça ragihandinê de.
- Ferînaz nûnertiya dîrok û hebûna Kurdan dike, pirsgirêka gewre dema hin kes li vê bûyerê weke bûyerê jinekê lê bînerin.
- Ez aşîqa strana Rojhilatê Kurdistanê me, her dengê ji wê imbiatoriyeke mûzîkî ye.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd



Wek ku mèvana me xwe dide nasîn em jî wisa wê pêşkêş dikin: "Navê min Xunav e, ez di 21 heyva Berçileyê sala 1992 an jî dayik bûme, ji bajarê Heskê me, havê min endeziyarê çandîniyê û mamosteyê zimanê Kurdî ye, û diya min karmendekî di dezgehên hikûmetê de ye, em sê zarok in, ez ya nêvî me di malê de, û keça mezin im, min wêjeya Erebi li zanîngeha Heskê xwendîye, û niha ez li Qamişlo dijim, helbestê bi zimana Kurdî û Erebi dinvîsim, herweha di warê ragihandina Kurdî de ji kar dikim".

- Helbestvan Xunav Kano kengî dest bi nivîsandina helbestê kir?

di destpêkê de ki ye ewê merov dike helbestvan, helbest rojevê e an pesn e, normal e an jî werêke taybet e, pênûs e an jiyana e? dema ez li dibistana navendî bûm di pola 10an de bûm, temenê min 15 sal bû, dema sipe bûm, min jî waneyên zimanê Erebi û Ingilîzî hez dikir, li hêviya se'atên wan dimam weke zarokêkî hêviya beyaniya cejnê be, û ji bendewariyê di xew de neçe, weke zarok min nizanibû çî hest e, lê tê bîra min dema mamosteyê min behsa "Şekisbîr" dikir peşkin ji wê kaniyê li min diketin, dema mamostê zimanê Erebi dest bi şirovekirina deqê helbestê dikir piştî xwendinê, weke bablîsokekê min behsa hest û wateyên wî helbestvanî dikir, dema min li stranên "Um Kelsûm" guhdar dikir, bi gupgupên dilê evîndarekî dema evîna xwe didit, min pênûs û rûpel tanî û gotinên stranên dinvîsand, dema şev li xakê diket li mala xwe li Heskê li ser banê malê-di wê demê de-weke trafikekî min çavdêriya stêrkên dikir, û çavên minî nezan nêçîra wan stêrkên dikir weke ku ez mîra aşîman im, piştî re min dest bi nivîsandina bîranînên xwe kir, bîranîn in balkêş bûn, min behsa jiyana xwe ya rojane bi rengekî helbestane dikir, helbesta minî yekemîn bi zimana Erebi bû, ew li ser terezorê bû lê bi wateyê nûjen bû, behsa qedê û xwesteka mirov di jiyana de dikir, nuha 7 sal derbas bûn û hîn ez berdeyam im di nivîsandina helbestê de...

- Helbest çî dide te û çî ji te distîne?

helbest azadiyê dide min û jîwera minî derûnî ji min distîne, wateya hebûnê dide min û ne aramiyê ji min distîne, gulê dide min lê xunava wê ji min distîne, awazek xweş dide min lê amûrên mûzîkê ji min distîne, baranêkê dide min lê ewran ji min distîne, germbûnê dide min lê rojê ji min distîne...

Helbest salên jiyana min kêr dike, lê hestên min mayinde dihêle...

- Hûn çî şeweya helbestê dinvîsin?

min diyar kir ku bi du zimanan dinvîsim, bi rastî min bi Erebi destpê kir, û hîn ji berdeyam im û ev sê sal in ez helbesta Kurdî dinvîsim, destpêka deqê min kilasîkî bû lê piştî re min warê pênûsa xwe yê rasteqîne di helbesta nûjen û azadî di her du zimanan de min didit...

- Kevin û nû, bêtir Xunav Kano ji kê re xwendîye, û bandora kê li ser heye?

bêhtir min wêjeya Erebi dixwend, bi taybetî helbestên Erebi destpêka min Nîzar Qebbanî, Mehmûd Derwîş, Ehmed Şewqî, Ebû Fîras Elhemedani, piştî re min berê xwe da romanên Erebi û bi taybet yên nivîskar Necîb Mehîfûz min gellekî jê re dixwend, herweha romana Sûrî weke ya Henna Mîna, hin wêjeya Rûsî ya wergerandî weke Distoviskî, piştî ez derbasî zanîngehê bûm asoyin nû di aliyê wêjeyê de ji min re vebûn, min dixwest ez ragihandinê an zanistên siyasî bixwînim lê şensê ew bû ku wêjeya Erebi bixwînim, dema min Mu'alleqatên Erebi xwendin weke ku nameyek ji min re were ku helbest dikare mirinê têk bibe, her pirtûkek bandoreke we ya cûda heye, wêjeya rasteqîne nahêle tu pê bêbandor nebe, nahêle tu wê ji bir bike, her rûpelek jê mîna darekî di baxê biranîna te de tê çandin, dema ez ji pirtûkekê hez dikim bê hemdî xwe ez kesayet û bûyerên wê ezber dikim...

dema ez li valahiya jiyana dinerim, romana heste ya Henna Mîna tê bala min, dema giranbûna jinê dibînim malikên Emre'û Elqeys tîn bîra min, dema jiyana bi firehiya xwe li min teng dibe kesayetîya Emîna ya di romana "Ez Azad Im" ji Ihsan Ebdul Qidûs re ber çavên min diyar dibe...

- Nivîsandina we ji helbestê re bêtir bi kurdî ye yan bi Erebi ye?

Sê salên dawî şerekî gewre di navbera hest û dirbirîn û zimanê min de çêdibin, ez dixwazim nivîskara herdu zimanan bimînim, lê di dema dawî pênûsa min ber bi aliyê zimanê Kurdî ve diçe, weke rîyeke hemû libên zeytonan bo gihiştina malê, wisa

pênûsa min di rêça zimanê Kurdî de dimeşe...

- Hûn jî bîlî helbestê di çî cureyê wêjeyê de nivîsandinê dikin.?

Ez gotarê bi her du zimanan dinvîsim, caracaran hewldan hene ango deqê wêjeyê bi saya hest dixwaze xwe bi rengekî nû derxe, mîna çîrok û şano, berî demêkê jî min nêzî 50 rûpelî ji romaneke Erebi nivîsand, û min berdeyam nekir...

- Xunav Kano beşdarî tu fêstîval û pêşbirkê helbestî bûye?

şevbûhêrka minî yekemîn di sala 2012an li zanîngeha wêjeyan li bajarê Heskê bû, piştî re ez beşdarî gellek şevbûhêrkên hevpar li Qamişlo û Heskê û Amûdê û Dêrikê bûm, herweha berî salekê ez beşdarî fêstîvala Buharê û ya helbestê bûm bi helbestên Kurdî...

pêşbirkek li navenda Zelal li bajarê Qamişlo çêbû bi zimanên Kurdî û Erebi, bi zimanê Kurdî ez beşdarî wê pêşbirkê bûm, û di helbesta Kurdî de biser ketim...

- Wek jinek nivîskar, hûn çawa şoreşa Sûriyê, û ya li Rojavayê Kurdistanê dinerxînin?

Di nerîna min de şoreşa Sûriyê ya jiyana Sûriyê bi tevahî bû, û azadiya ku milletê Sûrî dixwest bi dest bixwe îro hêdî hêdî ji bîngeha perwerde û mejiyê Sûrî diguheve, weke tabloyeke ku ji nû ve bê nîgarkirin û keskesoreke xemilandî li ser reşbûnê bineqşîne, şoreş li Sûriyê pêwîstîyê girîng bû û divabe ku ev şoreş berdeyam bike û biser bikeve, tevî hemû hewldanên rêjîm û opozîsyon û hêzên Îslamî wê têk bibin, lê ez dibêjim şoreş ne ya kesekî şoreş tenê ya millet e... Herweha ji bo ku welat nemîne zindaneke mezin û hewelatî tê de bi azadî bifire divê ew hesinên dora azadiyê bîn şikestin, û roj ji nû ve li ser hêlîna mirovahiyê hilê...

Riya şoreşê li Rojavayê Kurdistanê hat guhertin, dema milletê Kurd li azadî û netewa xwe digerya û hîn wareke xwe yê normal nedîtibû hêzên tundîrew derbasî herêmên Kurdî bûn, û nema armanc şoreş e, ermanc bû jiyana!!

- Sedemên wan pirsgirêkên di Yekîtîya Nivîskaran de çî ne?

Ez endama yekîtîya Nivîskaranê Kurd li Sûrya me, di kongirê yekemîn de ez tevî wê bûm, ez beşdarî hin civat û şevbuhirkên wê bûm, di wê demê de tevlihevî di gellek wan de çêbûye, warê nivîsandinê yek ji wan wara ye, Herweha ez ne gellekî bi ramana hebûna yekîtîyêkê ji nivîskaran re me, tenê eger bikaribe bi rola xwe rabe û xewnên nivîskaran belengaz bi cih bike, sedem ew e ku bêhtirê nivîskaran ne

nivîskar in, û ermanc pênûsa wan ne wêje ye!!

- Tu programê siyasî jî pêşkêş dike, tu nabîni ku helbest û siyaseta du xêzên rast in tu car li hev rast nayên?

Helbestvanê Sûrî Edonis dibêje: Tu karê mirov tune ye jibîlî qeşartina pîvasên aşîman...

Her mirovek azad e bi karê ku dixwaze bike, mirovê helbestvan ne miroveke siperî ye, ew xizan dibe karên baş û ne baş dike, ew xemgîn dibe û caracaran hêviya destekî dimîne ku hêsirên wî zuha bike, rojnamegerî nêzîktirîn kar e ji helbestvan re, herweha bernameyê min ya siyasî çûreyeke ji ragihandina ku ez tê de kar dikim, mirovê ragihîner sinor jê re tune ye, dema ermanc were destnîşankirin rêç hesan dibin...

- Berhemên we yên çapkîrî çî ne?

Ta wê demê hîn min biryarek ne stendiye bê kengî ez ê pirtûkên xwe çap bikim, nuha du reşnîvisên min hene yek komek helbestên bi zimanê Kurdî û yek din jî bi zimanê Erebi ye, herweha ez ferhengêk navan amede dikim bi Kurdî, di heman demê de ez wergerandina komeke çîrokan bi zimanê Erebi dikim bi zimanê Kurdî, dibe ku helbestvan leşker be, ew serdema kevin ya ku divabû helbestvan tê de miroveke fermî be bi cil in rêç be û herdem xemgîn be çû...

Nuha dema lêkolîn û belgekirinê ye, afirandin namire lê hest û bîpîrsiyartiya helbestvan nahêle ew li himberî rewşa hawîrdora xwe lal be, ji ber wîlo gerek e ez hemû alikariya ku welatê min ji min dixwaze jê re pêşkêş bikim, ji ber ku ez jê hez dikim...

- Li ser karê xwe wek ragihîner, û swedî program biaxive?

Berî sê salan ez derbasî xêza ragihandina Kurdî bûm, destpêka min bi kenala Hewlêr ya Başûrê Kurdistanê re bû, bernameyê min bi navê "Ronahiya Rojava" hebû, ew bernameyê heftane bû, li ser rewşa jiyana li herêma Kurdî li Sûryê bû, piştî re ez bûm peyamnêra kovara Welat ya bajarê Qamişlo, nuha ez di radyoya Welat FM de kar dikim, herweha ez rêvebira beşê Kurdî di radyoyê de me, 3 bernameyên min hene yek bi navê "Çîrûskên ji welat" e li ser behremendîyê li kantona Cezîrê ye, çî mûzîkî, nêgarî, nivîsandin, huner, û hemû warên afirandinê ye, herweha bernameyê din bi navê "Şûna Xunavê" heye ew li ser helbestvanên Kurd û Erebi in, bernameyê min ya siyasî jî bi navê "Bi Zelalî" heye, ew li ser partî û rojeva siyasî ya Kurdî ye, herweha ez nûçeyan bi zimanê Kurdî jî pêşkêş dikim, ragihandina Kurdî westan jê re

divê, ji mafê wê navçeya ye ku pêş bikeve, normal e di wê demê de gellek tevlihevî di kolanê ragihîner de çêbibe, ji ber nûbûna vê serhatiyê, lê piştî çend salên din em ê ragihandineke pêşkêş bibînin, weke jinekê Kurdî di warê ragihandinê de kar dikim, ez dibînim ku divê cûdahî di navbera jin û mîrê de di ragihandina Kurdî de tune be...

ji ber weke ku Mehmûd Derwîş dibêje: "Jin nexweşike heye biaxive", herweha ez dixwazim ji jinên ragihîner re bibêjim ku divê hûn jinbûna xwe ji bo kar bi kar neyînin...

- Di wê derfetê de ragihandina Kurdî peyamek wê aşkere heye, çî ye?

Nizanim mebest kîja ragihandin e, lê dikarim du persivan bidim, heger em behsa ragihandina Kurdî bi giştî bikin, peyama ragihandinê bêhtir partîyan e, ne netewî ye, gendelî di hemû warên ragihandinê de heye, herweha herdem piştigiriya diravî dibe listikvanê serek e di rêça ragihandinê de, peyama ragihandina Rojavayê Kurdistanê nuha ne gellekî diyar e lê bêhtir rewşa jiyana bi taybetî şerê ku diqewime li navçeyê ye, hewldan ji aliyê hin ciwanan tê kirin ku peyameke zelal û rewşenbîrî û civakî ji şopêneran re rêkin, ku dîrî hemû ecindeyên siyasî be...

- Wek çekê kurd, rola jinê di van salên bûrî de çawa dinerxîne?

Bi rastî jina Kurd ji sedên salan ve ji civaka hawîrdora xwe pêşkêşî e, di hemû warên jiyandê de, ji dema ku jin û mîrê Kurd jîyan û kar bi hev re dikirin, şivan û Bêrîvan bûn, di warê ragihandinê de jina Kurd bê piraktîk derbasî vî karî bû, û dikaribû di wê ezmûnê de biser bikeve, lê mixabin di warê nivîsandinê de bi taybetî ya wêjeyê hîn gellek rê mane ta jina Kurd xwe ji hawîrdora xwe azad bike, û hestê xwe yê taybet binvise, bê çavdêr û reqîb hebin, dema jina Kurd xwe ji tîrsê di pênûsê de xelas bike û xwe ji hestên kertonî bişo, em ê de helbestvan û nivîskar jin rasteqîne bibînin...

- We çawa bûyera "Fîrînaz Xisrewanî" xwend, û rapêra ku niha li bajarê Mihabadê Lidare?

Ferînaz nûnertiya dîrok û hebûna Kurdan dike, pirsgirêka gewre dema hin kes li vê bûyerê weke bûyerê jinekê lê bînerin, Ferînaz kêşeya milletekî bindest e û birçiyê azadiyê ye, ne bûyereke normal e ku bi jinekê re çêdibe, herweha tevî ku ez tekez im ku wê ev şoreş vemire, bi darvekirin û kûştin û girtinê, lê tu carî nayê jîbîrkirin û de bibe efsaneyek ji herçar perçeyên Kurdistanê, mîna Leyla Qasim...



- Wateya van gotinan li rex Xunav Kano çî ne?

- Helbest: Hebûn- Evîn: derew- Stran: Guh dike bi wate- Brexwedan: Pêşeroj - Rojavayê Kurdistanê: Welat - ragihandin: Nanê rojane.

- Hejmarek baş ji jinên nivîskar hene, gelo çima hûn ji xwe re hevgirtineke jinên nivîskar çênakin?

Nizanim çî wateya baş e di wê pîrsê de ye, nuha di deriya Kurdî de berê gemiyê li pênûs û nivîsandinê ye, pirsigrêkên wêjeya Kurdî gellek ji yekîtî û hevgirtinan mestir in, karê serek e û pêwîst di wê demê de nivîsandin e, bitaybetî bi zimanê dayikê, nivîsandina hemû çûreyên wêjeyê, xewneke min e ku ez dibînim ku jina Kurd ne tenê helbestvan û çîroknivîs be, xewn ku jin lêkolîn û xwendinan çêke di wêjeyê bi tevahî de, û pencereyên nû di afirandinê de veke...

- Çî muzîk bala Xunav dikîşîne? Mûzîka resen û kevna, herdem kesên min nas dikin ji min aciz dibin, ji ber gellekî li mûzîkê guhdêr im, herweha ez ne weke keçe hevalên xwe di temen û zanîngehê de me, mûzîka nûjen tu carî bala min nakşîne, filkor û dîroka Kurdî di kilameke dengbêjiyê de ye, yawww çiqasî mûzîk gewre ye??

Ez xwe di awazên Ferîd Fircad de dibînim, mûzîka Rojhilatî bi tevahî siya hebûna min e, nuha ez aşîqa strana Rojhilatê Kurdistanê me, her dengê ji wê imbiatoriyeke mûzîkî ye, tevî ku ez gellekî jê fêhm nakim lê mûzîk zimanê cihanê ye, herweha mûzîka pilebilind herdem rîya xwe ji guh û hestên min re dibîne, weke mozahingiv dema rîya xwe di gulan de dibîne...

- Tu wek jinek helbestvan, ta çî radeyê xwe di warê ragihandinê de dibîni, û dikarî nameyê bigîni?

Herdem helbest û rojnamegerî girêdayî hev in, herweha mirovê jîr ê dikare her karekî bi mercên wî bike, ragihandinê karê min e ez bi wê fêrî gerdûnê dibim, û wan zanyariyan diyarî mirovahiyê dikim, helbest jî siya min e, ez jiyana xwe ya rojevê dikim hest û wan di çemê wêje û hest de dirjînim...

- Gotina dawî.

Nivîsandin karekî jinê ye, û weke Xunav Kano ez bi zelalî dibêjim ku di hemû rewş û temenê min de, min tu kes jî helbestê dilsoztir, û rastir nedît, rast e ez dilopên can û hestên xwe li ser wê dibarînim, lê ew hebûn û kesayetîya min ava dike...



## Deqin Hayko ji hejmarek nivîskarên Erebo ku di pêşbirka rûpela Hayko – SY an de a di 7/4/2015an de biser ketin

- 1 -  
Li sûka zêr  
Şûna tiliyan li ser  
Camê dikanan  
Xewn in paşxistî ne  
«Xesan Cedîd»  
- 2 -  
Tev serma Zivistanê  
Hindek germbûn dide min  
Lerzîna tirsê  
«Luey Dirxam»  
- 3 -  
Li Sûkê  
Ji nişka ve xwe dibînim  
Neynikêk firotinê  
«Elî Deyûb»  
- 4 -  
Pûşê hêlînê  
Ku kevokê dane hev  
Têra birajîna wê dikin  
« Umer Dirxam»  
- 5 -  
Ne tenê li Heyvê  
Temaşe dikim  
Bi xwe re me vê şevê  
« Xada Mihyedîn»  
- 6 -  
Li gulistanê  
Vedengên dengê wî  
Ji hêlaneke vala  
« Mihemed Dirxam»  
- 7 -  
Her du çavên masî ên girover  
Devê wê ê vekirî  
Ev e matmabûn  
« Hena Ebdo»  
- 8 -  
Dara Yasemînê  
Tazî, di bin baranê de xwe dişo  
Ji piş pencere, nerînan didi-  
zim.  
« Mehmûd El –Recebî»  
- 9 -  
Di bêrika qapûtê xwe de  
Li ba digere  
Destê yê xizan  
« Ebdilsetar Bedranî»  
- 10 -  
Li ser du perçe tep  
Tiliyên wî xaç dibin  
Tevgeranê listokan  
« Ehmed Milyanî»  
- 11 -  
Banê derizî  
Tu ji çemento ditirse  
Balefira kaxezi?  
« Inas Esferawî»  
- 12 -  
Di nav darên berhemdar de  
Şaxeke tazî  
Xwe spartiyê heyvê  
« Rena Giwênî »  
- 13 -  
Deh tiliî  
ne besî min in  
bo valahiyê bijmêrim  
« Meysûn Erefê »  
- 14 -  
Ji kanî  
Tibûn  
Diherike  
« Samir Hemrûnî »  
- 15 -  
Li ser çem  
Dengê xuşexuşa avê  
Û xuşîna bazinan  
« Zeyneb Ebdilmecîd»

## Em Her Man

Em in bingeha tev ola  
bi destpêka çiya û çola  
me got ji êzdan re hole  
berî peydabûna dîna .  
Bi av û agir û bay  
bi heyv û roj û ronay  
me nas kir sira xweday  
berî Tewrat û Yasîna .  
Lê dijminêd ola paqij  
çav sor û gawirêd xwînmij  
bi talan û fermandêd komkûj  
li cihanê em belakirî ne.  
Li dema dewleta Osmanî de  
me xwîn û can û serî da  
li bin rijêma berberî de  
bi rastî me got em kî ne .  
Li seranserî hemu çerxa  
em ser birin weke berxa  
xwîna me bi kêmtirîn nexre  
diherke ji deriya birîna .  
Ji melyona em mane hindik  
ji bajara bûne gundik  
gelek tiştê bi biha û rindik  
kete bin simêd mehîna .  
Kê qasî me li vê dinê  
vexwar ji meya mirinê  
ji destê dijminêd behtinê  
xwe parast bi qet û pîne .  
Me dest ji dozê berneda  
a şêrî jî me bider neda  
em hilavîtin li lep xwe de  
weke ba û kevne kwîna .  
Li wan şevêd bê sibeh de  
li wan xaniyêd bê dergê de  
li nêv minêkêd bê bergê de

## Rojavaya Şehîdan



Dil ji sîngê têye der  
Li ber gewriya rûmetiya we  
Serî ditewîne...  
hey zarokên agir û rojê  
roj û agir matmayî man  
destan û evsaneyên  
we nûsandin  
peyker û nekarînan hejandin  
ji wan lêvên naz û hingivîn  
bager û agir û birûsk  
ji ku ve derhatin  
jina Kurd  
ne bi tenha hûrî...û buhar in  
di eynî demê de  
Şah siwar û laçîn û baz in  
Ne pesnan didim  
Weha  
Kûbanê  
Serê Kaniyê  
Tel Hemîs û Til Temir  
di rûyê bermahiyên heccan  
de  
qêriyane ...  
û ez vedibêjim  
Rojavayê xewnên Şehîda



hêj em sax û ne mirî ne .  
Gelek dost û cînarêd me  
diketin nav rez û darêd me  
mirin didane warê me  
loma dîroka me xwîn e.  
Lê warê me li nav xwînê  
ket xebat û tekoşînê  
ji ber navê me bimînê  
pir cara xwîn geza zîna.  
Li gelek fermana em girîyan  
me xwe parast û neferîyan  
ji dara ayna em ne werîyan  
em aşîxwazîna êzîdî ne .  
Bi qasî stêrêd ezmana  
Bar kirin çûne zehmana  
tovê biratiya însana  
me çand li gel tev ayina.  
Gelek ji zarokêd Şingal  
hebûn weke Zerdestê kal  
xwedan felsefe û galegal  
lê mirin bi destê xayna.  
Lê îro dibên gelek zane  
dîrok li ber çavê wan e  
mendewar jî yek ji wan e  
em her man û her mayin e .

## Buhar Zengil Dihejîne



Buhara min çima her dem  
kiras sor e ?  
çima peyv ariya li ber bay e?  
kêf di dest de  
xem di dil de  
banga xewna mayî  
tê bibe ji kê re?  
Gurzên gula  
binax dike  
çivîk û bilbilan dixenqîne  
çima rojên te bê bejin in  
daristanên xeman e  
perçebûn te dorpêç dike  
Kevok û kulîlkên te dişewitîne  
Buhara min çima zengil  
dihejîne?  
Mirinek nû dîsa dide min  
Va govend û stran e  
Ken e  
Gav li kolana dilîrînin  
Dev sirûd in  
Pinpinikê kesk û sor in  
Piroz be pîroz be  
delala min  
sibe cejn e  
Baskan vegrin  
Perça bihev din  
Ne kevir û dar in  
Ne av û xunav in  
xwîn û gewd in  
Dest û ling in  
Ser û çav in  
Çîçek û benefş in  
Dê û bav in  
Şeva me gurê dev bixwîn e!!!  
Navê pakrewanan bi agir ser  
sînga te datîne  
Beyar.. Ciwan û Çîço ne  
Evîn.. Nervîn û Nermîn e ...  
Ahora Mezda ... Ahora Mezda  
Çima Newroza me her demê  
sor e??

www.buyerpress.com  
f buyerpress t buyerpress  
e buyerpress@gmail.com  
WhatsApp

büyer

Nûçe... Bi Zelatî

## HÎNA ZÛ BÛ



Hîna zû bû  
Ji dilê min, te bar kirî  
ma çi bûbû?  
ew xeyda te  
dil û raman talan kirî  
hîna zû bû...  
Evîna te, ew bihna te  
hîn li çola buhara min dikin  
girî  
hîna zû bû...  
Te hestên min tev şikandin  
te jîna min bi xwe re pîr kir  
li kolanê vê gerdûnê bela kirim  
li ber deriyê kul û derdan  
gelek dêşim  
te ez hiştim  
li şûna xwe  
çi tiştên xweş te bi xwe re birî  
hîna zû bû...  
Ew kulîlkên me çandibûn  
hîn zarok in  
ew maçên te  
di bêrikên xewnê min de  
heyv û rok in  
xweş hevok in  
hîna zû bû...  
Em tenê bûn  
te çi digot...!!  
Min bawer kir  
dest di dest de  
çav di çav de  
heta sibê em şiyar bûn  
qet ji hevdû em têr nebûn  
çima wa bû?  
Bakî dijwar li me rabû  
gelo rast e gunchkar im?  
Bêje perî ..  
hîna zû bû...  
Wilo wilo  
te ez kuştim  
di nêv pîrsên awirên xwe  
te ez birîştim  
gelek caran  
li berpêjna nîgaşên xwe  
te ez ristim...  
ji dilê xwe bawer meke  
derewîn e... xapînok e...  
Ji bala xwe  
te min avêt bi erzanî  
bi wê ava azariyan  
te ez şuştim  
hîna zû bû...  
Er ê ez im  
min dil da te  
min xew da te  
min dem da te  
min rastî da te  
û te çi dixwest  
min dida te...  
Erê erê ji bona te  
mest û dil bûm,  
hîna zû bû...  
Va tê here..  
tu bi xwedêkî venegere  
nema ji te bawer dikim  
ne ji xapên hêsrên te  
û ne ji peyvên wan lêvên te  
nema bo te  
wekî berê gelek dêşim  
ji êşê re, xaçirêk im  
ez dildar im...!  
Ji lewra ez wêneyên te  
xeyala te, evîna te  
her tiştên te  
ji serê xwe dûr davêjim,  
hîna zû bû...

## Ji bîranên rûpelên rojnivîsan



1  
Li ber sîmfoniya wendabûna  
rojê  
Li ser baskên xewnan  
Tu semayê dikî  
Û ez jî...  
Li pencereyan re  
Ew ên şkestî ji dengê  
Birûskên tava kenê te  
Guhdariya tevger û livîna  
Keziya te dikim  
Dema ku çûk ji bin difirîn  
Wê demê  
Hêsrên min jî  
Penaberî ser tazîbûna laşê  
rûpelan dibin  
2  
Raserî kêşwerên tî  
Tu dibî parçeyek ewir  
Hezar dest  
Hezar daxwaz  
Hezar pîrs  
Berev te bilind dibin  
Û ez jî  
Li rexa dêmistana hêviyên  
xwe  
Te vexwendî nav germahiya  
Birîna xwe dikim  
bi xwîna min re tevî nav  
Meya pêka min dibî û bi hev  
re  
Hûn derbasî nav helbestekê  
dibin  
3  
Li demsala werîna pelan  
Tu dibî ye kuliyekek berf  
Û bi nav çavên axê de dihilî  
Ez jî...  
Dibime daristaneke zîndankirî  
Li nav çaxên xembariyê de  
Poşman dikim sistema gerdûnî  
Dahênerên xwezayê riswa  
dikim  
Û berî ji qamdeketina dawî  
Te silav dikim  
Û sirûda vejîna te dikim  
sernavê  
Serhildan û destkeftên dîroka  
çêbûna salnameyê

## Riya Mirinê

Hîn roj nehilatibû min ji xewnên  
xwe xatir xwest  
Bi gemiya zaroketiya xwe ...  
di nav deryayên xeyalan de  
min berê xwe da welatekî wînda  
Bi beriya bavê xwe ya qetiyayî  
min pikêta mirinê kirî  
Bi derziya nîgaşan  
min ji xwişka xwe re kerasek  
dirût  
Bi wî welatê wînda  
min sînorên bi stîrî li pêş kenê  
birakê xwe qetand  
Lê min nizanibû wê hêsrên dayî-  
ka min gemiya min daqortînin ...  
û ez ê di nav keserên evîna li  
pey xwe de bifetisime  
Bibûre bavo, min nikaribû  
nêçîra hêviyên beriya qetiyayî  
bikira  
Bibûre keko, ava derya şor e,  
min nikaribû kenê te pê av daba  
Bibûre xwişkê, derziya çolikan  
bi tevî gewriya min di deryayê  
de wînda bû  
Bibûrin min nikaribû li wî we-  
latê bazda

## Miftî û çend çirûsk



Dergehê asîman vebû  
Sîtêr hatin xwar  
Rengê pertewê hate guhertin  
Di zindanek vekirî de  
Li desta Alûcî  
çav westiyân  
çog lerizîn  
ma wê hêsr xwînê bişo..heva-  
lo  
li welatê me  
di heyamên paşguhkirî de  
digotin: Zarok çirûskî  
di quncikên tarî de..  
de ka em pencereyan vekin  
ji qumrî û çivikan re  
vaye bi mayinan  
me pîroz dikin..hevalo  
bi golên xwînê  
tiliyên demê hine dikin  
dirêfşê Kawa dizî  
Rexşê Rustem...  
di laşên çelmişî de  
cihokên herbangê dikolin  
hêêê.. ma hûn çi ji birînen min  
dixwazî  
wan najon bi hêla sinor û  
windabûnê ve  
di şevê de bêtir geş dibin  
xunçeyek ... du gulokên berfê  
li ser çavên wê  
girmijîna binavkirinê  
li ser lêvan dijirîsî ...digot  
Ma evqa birîne min tirsok in  
bavê min çû  
diya min çû  
çavê min çû  
bihêlin ez bigrîm..  
hinek bi xwînê  
bejna xwe şuştin  
hinek bûn tiraf  
lê ne şewitîn  
êş bêdeng ma  
goristan pala xwe da gopalekî  
û mistek gazin belavkir  
despêka şevê bû  
Sheher xunav ji ser mijankê  
xwe dawşand  
û bi şengebiyê re  
bo mirinê dikeniya  
keskesor reş girêda  
li ser welatê veşartî  
di çavên evîndar  
û di çavên zarokan de.



masiyan pêlên min xwarin  
Bibûrin ez nikarim mîvanê ve-  
gerê bim,  
rêç û riyên derya nîn in  
Tenê dixwazim ku win silav û  
nameyên min bigihînin de û  
êvînê û bibêjin :  
Qey ez şehîd im ku bê kefen  
çûm  
Û gora min jî ji welat mestir e,  
tên ji himpêza we piçûktir e  
lê zanibin  
ku bîrkirina we hestiyên sînga  
min şikêndandin



**Dîroka Sitrana Evînê**

Melayê Cizîrî weha gotiye:  
Min di seher şahê mecer lebsê di ber mexmûrî bû  
Ew dêmzerî surmîşterî ya reb perî ya hûrî bû  
Evînek li ber azman ve çû û gelo ev çî evîn bû?  
Di dema mirovatî hat, evîn tim û tim hevalek bi êş û kul bû, lê gelo çîma çîrokê evînê di sitranên me de bi xem û sil in?  
Çîma encamê evîndaran tim bi derd in?



Şivan Temo

Hunermend di çîhanê de mîna vedenga jîyanê ye û her gav bi gotin û awazan wan keserên avîndaran şîrov dikirin, her kes bi rengê xwe wênayê xema bi çavêkî didît.  
Lê çawa evîn bi guhertina demê tê guhertin? wilo sitran û gotinê helbestvanan di yek ritmî de tîn guhertin. Wek em zanin me gelek çîrokên evînî mîna (Mem û Zîn) nas kirine, ev hezkirina ku Ehmedê Xanê şîrov kiriye bi gelek dangan hat gotin, û li ba mîletê Kurd bû wek mînaka evînê....

bersiva keçekê weha bû; evîn di dema berê de bi êş û şewat bû, lê niha evîn bûye wek genimê pûç ne reng û ne nex hema ji bo wensê ye, carnar xort gelek dostikê wî hene û dema dibe rastî... dibêjê ez ê herm dervey welat, loma nema evîn li ba min derd e...!  
Gelo çîma ev dem wilo bûye kanî mîletê qamişlo di dema 14ê Reşmehê de me ken li ser lêvan didît û niha ji bilî belin sipî û wênayê ji bo pasportê nabînin... Me jibîr kir ku evîna mezin evîna welat e, hezkirina welat e ?.

Lê gelo rast e, ew evîn hîn heye? Hîn rastî di dilan de di nav xemê jîyanê de maye...!  
Min ev pîrs ji gelek xort û keçan, li gelek taxana, li bajarê evînê (Qamişlo) kir û bersiv gelek bûn û wiha bûn:  
Evîna berê ji dil bû û li ser lêva dihat gotin, lê niha evîn bi Facaboka ye û li ser malperan tê gotin, lê demek hat nema gotinê hezkirin tîn gotin, niha tenê bi wênayê dilê sor e.

Qamişloka Evînê ... Ka evîna te?  
Bersiva Qamişlo wiha bû; hîn dayik bang dike zarokên xwe û dibêje: Kurê min... Keça min...!  
Hîn kur dibêje: Yabo û Yadê .. û bav û dê dibêjin çî ye berxê mino ....  
Hîn xort dibêje: Çavê min. û keç dibêje: Çi ye dilê min....!  
Ta ev roj û şev ji hev cuda nebin, evîn ji Qamişlo winda nabe.

**Li Bajarê Heskê Çilrojîya Şehîdên Newrozê Hate Bibîranîn**



Yeketiya Nivîskarên Kurd-Sûriyê şaxê Heskê çilrojîya şehîdên Newroza Heskê bibîranîn, ew şehîdên ku di şeva Newrozê de di operasyonê terorîst de jiyana xwe ji dest dan, ji ber vê yekê û bi amedebûna hejmarek baş ji rewşenbîr, nivîskar, malbatên şehîdan, û xelkên bajarê Heskê şevbuhêrkek helbestî hate lidarxistin.  
Helbestvanên ku di vê şevbuhêrkê de beşdar bûn ev bûn: Mehmed Sebrî, Salih Heydo, Birhan Hiso, Mişe'1 Osman, Gulal Kasanî, Umran Menteş, Jînda Mihemed,

Seyfedîn Qadirî, Luqman Ebdîrehman, û Xalid Umer.  
Şevbêrkê bi demek kurt li ser canê pakrewanan destpê kir, pişt re helbestvan Mehmed Sebrî gotina Yekîtiyê pêşkêş kir, êdî helbestvanan helbestên xwe xwendin, herwiha helbestvan Umer Şiblî yê ku hevsera wî, û keça wî di vê teqînê de şehîd bûn, ew jî tê de beşdar bû, helbestek xwend û tekez kir ku divê Kurd her dem yek bin.  
Di dawî de birêz Ebiduletîf yê ku kure wî di vê teqînê de birîndar bûbû, li ser yekrêziya Kurdan û xebata li dijî terore axivî.

**Li Amûdê Partiya "Elpartî" û "Elwehdê" Piştgiyaya Bajarê Mehabadê Kirin Partiya Demo**



krata Kurdî li Sûriyê ( Elpartî ) û parîtya Yekîtiya Demokrata Kurdî li Sûriyê ( Elwehdê ) meşek ji bo piştgiyaya Mihabadê lidar xistin, û tê de piştgiyaya gelê me yê kurd li Mehabadê kirin, û diyar kirin ku ew diji kiryarên rêjîma Îranê ne, û êdî hew ev kuştina ku li ser kurdan tê meşandin qebûl dikin.

rojnameya "Büyerpress" Îmad Micwel Endamê Komîta Navendi di partiya (Elpartî) de axivî û got: "Me dît ku erkê me ye em piştgiyê bidin gelê me yê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, û ev büyera ku ew keça Kurd xwe kuşt ta ku destdirêji lê nebe em vê yekê pirotostê dikin".  
Herwiha Serkirdeyê partiya (Elwehdê) Fehed Michim ji me re axivî û got: " Ev seknandin ji bo em piştgiyê bi Kurdên Îranê re bikin, ev rêjîma ku sistema rêxistina Dai's dimeşîne û ew tu rêzê ji mirovahiye re nagirin, em silavê ji berxwedana Mihabadê re dişînin".

**Navenda Biratî Hemleta" Piştgiyaya Rojnamegeriya Azad " Li Bajarê Heskê Xelas Kirin**



Navenda Biratî ya Civaka Sivîl û Demokrasiyê li bajarê Heskê piştî ku şes rojan karê wan dom kir, hemleta bi navê " Piştgiyaya Rojnamegeriya Azad" bidawî kirin, çî bi sêminaran bin yan bi çavdêriya rewşa rojnamegeriyê, û piştgiyaya rojnamegeriya azad bikin.  
Di dawîya vê hemletê de mangirtinek ji bo piştgiyaya rojnamegeriya azad li ber tabloyek mezin çêbû, ku li ser diwarekî nîgar bûbû, û bi wêne û siloganên piştgiyaya rojnamegeriya azad hatibû nexşandin, herwiha wênayên rojnamevanên ku li ser destê rêjîma sûrî, û li ser destê rêxistina Dai's ve hatibûn girtin û yên pakrewan bûbûn hatin belav kirin.

Li bajarê Qamişlo Hevpeymana Xortên Sewa, Komelêya Şawîşka, Mala Mandêla, Yekîtiya Jinên Kurdistanê Rojaya Azad, û Komelêya Aefrîn a Jinên Kurd roja şemiyê sekinandinek li taxa Xerbî di geroka "Munîr Hebîb" de ji bo piştgiyaya gelê kurd li bajarê Mehabadê lidar xistin.  
Lê tiştê herî giring ku asayişan ji ber ew sekinandin bê destûra wan lidar xistinbûn, nehiştin berdewam bibe.

**Bi Dirûşma " Li Ser Têla Sazê Em Rengan Nîgar Dikin " Çapa Sêyem Ji "Mehrecana Buharê" Li Bajar Qamişlo lidar ket**



bi vexwindinek fermî ji Hevpeymana Xortên Sewa û Navenda Arîdo ya Civaka Sivîl perdeya çapa sêyemîn ji "Mehrecana Buharê" li bajarê Qamişlo hat vekirin, 5 rojan ve mehrecanê hemû şeweyên ku di riklama xwe de diyar kiribûn pêşkêşî cemaweran kir.  
Roja yekem ji mehrecanê bi gotina serpirştîyên wê despê kir, ku ji aliyê Gulbuhar Mihemed ve hat xwendin, û tê de diyar kir ku mebesta wan jî ve mehrecanê ew e ku jiyaneke hevbeş biçesipinin. U êdî vekirina mehrecanê ragihand.

Bi dengê sê hunermendan mehrecanê despê kir, ew jî ev bûn: Hunermend Ciwan Cemil, Ferec Derwîş, û Hunermend Hogir.  
Roja duyem ji mehrecanê roja Şanoyê bû, bi koma Şano despê kir û şanoya "Goristanên Bê Kêl" Hat pêşkêşkirin. Piştî wê şanoyê koma Bermaya tabloyek ji govend û dilanên Aşûrî pêşkêşî cemaweran kir, û bi filimê " Zehmetî" yê derhinêr Sergon Şem'un perdeya roja duyem ji mehrecanê hat berdan. Roja sêyemîn, her wiha wek herdû rojên bûrî ku amedebûn ji cemaweran bêhampa bû koma "Saz Miyûzîk" ya ku hunermend Ciwan Cemil serpirştîya wê dike, û bi tevahiya xwe ji zarokên temen piçûk in, bi coşek mezin ewan stran û mozika xwe diyarî cemaweran kirin. U diçe ew roj bi filmê "Hevalê Riya Min" ê derhinêr Ednan Çeto bi dawî hat.  
Di roja xwe ya çarem de mehrecan bi Koma Eştar hat vekirin, Koma Eştar Şanoya "الجذل" pêşkêşî cemaweran kir. Pişt re

filimê "Ne Diyarî" yê derhinêr Dilêr Yûsif hat temaşekirin, êdî Koma Xelat ya huner û filiklorê kurdî, roja çarem ji mehrecanê gur kir, û bi pêşengeheke wênayî ku çend wênekêş tê de beşdar bûbûn perdeya ve rojê ji berdan ew wênekêş jî ev bûn: Sergon Şem'îdî, Nînos Şabo, Ferhad Ehmedî, Jiyan Yûsif, Zoya Ebidulrehman.  
Roja pêncem ku roja dawî bû ji ve mehrecanê ji bo helbesta bi zimanê Erebi amade jê re bûbû, û bi çend helbestavan şevê despê kir ew jî ev bûn: Helbestvan Azad Iniz, Ramsîn Ramanis, Milad Isma'îl, Salih Cango. Piştî ku gelek helbest bi zimanê erebî hatin xwendin, birêvebirê mehrecanê hemû kesên ku beşdar û alikariya lidarxistina mehrecanê kirin, hatin xelatkirin. Wek hat ragihandin ku wê dawîya ve mehrecanê gulav be, ew jî bi saz û stranên Koma Ferso hat xemilandin, û xatir ji buharê hat xwestin.  
Wisa 5 roj hemû pêkhatiyên bajarê Qamişlo bi çavên tije ken û jiyan beşdarî ve mehrecanê bûn.

**Şevbihêrkek Helbestî Li Navenda yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûriya**



Li navenda Yekîtiya Nivîskarên Kurd a bajarê Qamişlo Bi beşdarbûna gelek helbestvan û rewşenbîr li Qamişlo û bi xwendina helbestin evînî û netewî ji aliyê wan helbestvanan bi kêfxweşî ji aliyê guhdaran ve hate pêşwazîkirin. helbestvan

jîev bûn: Merwan şexê, Hena Dawûd, Salih Cango. di dawî de berêz Dilawer Zengî serokê Yekîtiya Nivîskarên li ser festîvala çîroka kurdî ya ku wê heyva şeşan lidar bikeve axifî, û got bê çî mercê wê ne ji kesên ku dixwazin hevbeş bibin.

**Xwepêşandan Bo Mehabadê Berdewam In**



Li bajarê Qamişlo Hevpeymana Xortên Sewa, Komelêya Şawîşka, Mala Mandêla, Yekîtiya Jinên Kurdistanê Rojaya Azad, û Komelêya Aefrîn a Jinên Kurd roja şemiyê sekinandinek li taxa Xerbî di geroka "Munîr Hebîb" de ji bo piştgiyaya gelê kurd li bajarê Mehabadê lidar xistin.  
Lê tiştê herî giring ku asayişan ji ber ew sekinandin bê destûra wan lidar xistinbûn, nehiştin berdewam bibe.

U ji bilî wilo Teygera Jinên Ciwan ji roja şemiyê li bajarê Qamişlo sekinandinek li navenda Mihemed Şexo ya çand û huner lidar xistin, û di wê seknê de diyar kirin ku zordarî li ser jinê li Rojhilatê Kurdistanê pir e ta ku keçeka mîna Ferînaz xwekujî kir, û tekez kirin ku ew büyer ne tenê destdirêjiya mêr li ser jinê ye lê belê ew diyar dike ku rêçîma Îranê ji wan rêçîmên paşmayî ne, û Ferînaz ji wê bibe wek agirê Kawayê Hestînar yê ku bû roniyek ji Kurdistanê re.

**Helbijartinên Endamên Nivîsgeha Cîbicîkirinê û Yekîtiya Werzişvanan a Desteya Ciwanan û Werzişê li Kantona Cizîrê Lidar Ketin**



Li navenda Mihemed Şexo ya çand û hunerê li bajarê Qamişlo du endam ji bo yekîtiya Werzişê û neh endam ji bo nivîsgehê cîbicîkirinê li kantona Cizîrê hatin helbijartin, bi amedebûna gelek komên filklorî û listekvanên tîma Cîhad.  
Di axeftineke taybet ji bo rojnameya "Büyerpress" Serokê Desteya Ciwanan û Werzişê li kantona Cizîrê Dr. Mihemed Fatimê axivî: " Me gelek zagon danîn ta

ku em werzişê li kantona Cizîrê birêxistin û pêş bixin, û li gorî ve zagonê encûmana werzişî li her deverê hate vekirin, ev encûman nivîsgehek cîbicîkirinê ji xwe re heldibjêre, û her encûman sîstemek wê taybet heye, mercên taybet ji hene, û wê di pêşerojê de gelek projeyên bîn lidarxistin. Pişt re du endam hatine helbijartin ji bo Yekîtiya Werzişê; Kêfo Osman û Ezîza Elî û neh endam ji bo nivîsgehê cîbicîkirinê.

**Maretona " Xebata Jinê Bê Sînor e " Li Qamişlo Lidar Ket**



Desteya jinê û Desteya Ciwanan û Werzişê li "Kantona Cizîrê" bi boncya roja çîhanî ya karkeran di bin navê " Xebata Jinê bê Sînor e ", maretonek lidar xistin, ev mareton ya bisklêtan bû, û di vê maratonê de gelek cemawer ji jin mêr hazir bûbûn, û bi taybet ên ku beşdarî maretona bisklêta bûbûn jin bûn.  
Ev maretona ku ji qada Osman Sebrî " Geroka Qermotî " ta navbirka Heskê - Qamişlo bi beşdarbûna 37 jinan ji hemû te-

menan destpê kir. Tîmek hewarçûnê ta dawî bi vê maretonê re bû, herwiha hêzên asayîşa jî bi wan re bûn, keça bi navê Nejîr Hesen biser ket, ew ya yekemîn bû, ya duyemîn Mizgîn Zêdan serkirdeya partiya Guhertin a Demokrata Kurdistanê bû, sêyemîn Zekiya Heyder Ibrahîm bû.  
Hêja yî gotinê ye, ev cara yekem e, ku maretonek taybet bi jinan li Rojavayê Kurdistanê lidar di-kive.



" 99 Morîkên Belavbûyî " derket



Nivîskar Helim Yûsiv romana xwe ya nû temam kir û da ber destê weşanxaneyê. Roman meha pêşiya me dê li ber destên xwendevanan be. Nivîskarê malpera me Helim Yûsiv romana xwe ya nû temam kir. Roman bi navê «99 morîkên belavbûyî» ye û niha li ber destê weşanxaneyê Peywendê ye. Ger em bînin ser naveroka romanê «Di roja şazdehê adara du hezar û diduyan de, ber êvarê, li herêma Nedersaksen a Almanayê, kurdekî porsîpî li kolanê dimeşe. Di destê wî yê çepê de, li şûna saetê, tizbiyek heye. Ji nişkê ve û ji paş ve xortekî alman ê bîst û

çar salî, derba kuştinê lêdixe. Bi ketina wî re tayê tizbiyê diqete û 99 libên tizbiya wî belawela dibin.» Helim Yûsiv bi hewara wî ve diçe û ji morîkên tizbiya wî kurdê porsîpî yê belavbûyî, morîk bi morîk, romana xwe ya nû dirêse. Weşanên Peywend par pirtûkên Helim Yûsiv ên berê derketibûn bi çapa nû gihandin ber destên xwendevanan û niha jî di amadekirina û weşandina romana nû ya Helim Yûsiv de ye. Li gor agahiyên ku me ji weşanxaneyê girtin meha adarê de dê roman bigihîje ber destên xwendevanan.

**Kurdî**  
**Xweş e**

- xayizbûn شروود
- bêcîrî شتراسا
- dilovanî شفقنا
- qerebalix شقنب
- solav شالان
- balayî شموخ
- kirêt شتبع
- bîrkirin شوقى
- bêoxirî شوم
- ciwamêrî شهامة



isam.isa.77

**Hejmara bûrî**

5	3	9	1	6	8	7	2	4
7	4	6	3	5	2	8	1	9
8	2	1	9	4	7	6	3	5
2	5	3	4	7	6	9	8	1
9	8	7	5	1	3	4	6	2
1	6	4	2	8	9	5	7	3
3	7	2	6	9	4	1	5	8
6	9	5	8	2	1	3	4	7
4	1	8	7	3	5	2	9	6

**Jimara bi tenê**

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagirtin di her malikê de, û herwiha tenê carekê were dagirtin li ser xêza asoyî û serjêr.

8	4	7	1
1	9	4	1
9	4	1	2
3	2	4	4
5	4	3	1
4	2	3	1
1	7	4	2
4	9	7	6
9	7	6	4
4	1	3	1

**Peyva wendayî**

D	D	I	G	O	T	I	N	N	N
E	C	A	R	E	K	A	I	I	B
M	D	I	L	O	O	M	R	N	I
A	X	O	N	B	N	S	A	D	N
M	D	I	N	A	E	V	M	I	N
I	N	A	W	N	A	E	N	A	C
N	E	E	Ç	T	U	M	I	N	
T	R	T	O	I	O	R	I	N	I
U	T	E	Y	I	R	E	Ş	K	
D	E	V	A	Ç	O	D	R	E	H

Peyva wendayî ji 5 tîpa pêktê, navê bajarekî Kurdî ye. (dema min tu – dîtî nesrîn – herdû Çavê – teyî reş – digrîn – ewan – Çavan – digotin – min – careka – din – tu min – na – bîn-dilû – canê – min- bû – xûn ).

**Pend û şîretên kurdî**

- 1-Bimre lê dest li ber kesî venegre!
- 2-Kurê bira nabe bira!
- 3-Piştî tengayê ferehî ye!
- 4-Jina xwe gelekî neşîne mala bavê!
- 5-Hîn mişkê malê ne bihîstiye!
- 6-Bi gulekê nabe Buhar !
- 7-Belkî di guhê ga de razaye !
- 8-Piştî xwe bi xelkê girê nede !
- 9-Barê ketî li qadê namîne!
- 10-Diza ji diza dizî,erd û ezman lê pirsî !

**Zûbêj**

Şimka Şero li şarê Şarezorê di şer de şewitî

**Mamik???**

Kewara agir hevîr dike nanê hazîr?  
Goleke şîn e, tije çirayên rengîn e  
Qasimê qûnxwar, çû serê darê dar anî xwar?  
Bersiva hejmara bûrî : Jûjî – Sîwan – Masî

**Hejmara bûrî**

D	i	h	o	K
---	---	---	---	---

**Xaçerêz**

1	2	3	4	5	6	7	8
1							
2							
3							
4							
5							
6							
7							
8							

**Hejmara bûrî**

1	2	3	4	5	6	7	8	
1	s	A	r	û	g	e	r	m
2	e	V	î	n	v			
3	y	A	s	a		r	î	
4	L	x	a	b	û	r		
5	ş	l	l	r	a	k	a	
6	o	S	l	o	b	e	n	
7	p	l	l	l	n	î		

**Rast**

- 1-nig – cûrek nivîskî li wêjeyê.
- 2-yê ku bi nesaxiyê bikeve.
- 3-agir (b) – tayê qalind.
- 4-dengbêjek navdar,biyanî ye.
- 5-dereng nemîne(b) – tersê germ.
- 6-civîn-jina ku merê wê mirî be.
- 7-mîzan.
- 8-karê pevekîrîna cil û bergan.

**Serjêr**

- 1-yê ku pere û tiştan ji kesên din dixwaze.
- 2-keç.
- 3-xwarinên ku şopek mezêlûq li dewse dimîne(b).
- 4-rê û kêşeya rêzanî – paşçek.
- 5-birako (b) – yak ji hejmaran,
- 6-navê keca Celadet Bedirxan (b) – tersê dereng.
- 7-hesp bi Turkî – tersê rake-tin.
- 8-wêne û peyker sazkin.

**Amadekirin: Xoşnav Heso**